



Efrîn di bin dagîrkeriyê de (132):

Pakrewanbûna du hemwelatîyan û girtin û îşkencekirina xelkê "Basûtê"- /75/girtî, teqandin û pevçûn, hin gund bûne avagehên leşkerî



قرية "باسوطة" - عفرين، قبل الاحتلال التركي لها في آذار ٢٠١٨ م

تفجير منزل عائلة المرحوم "شريف قاسم" - باسوطة في عفرين، ٢٣ شباط ٢٠٢١ م



تفجير سيارة "خان" قرب باسوطة - عفرين بتاريخ ٢٤ - ٢٣ شباط ٢٠٢١ م



حاجز مسلح للجبهة الشامية في مفرق قرية كفرجنة - عفرين



حاجز مسلح لـ "لواء الوقاص" في قرية سنارة - جنديرس

"Komîta Redkirina Zordariyan" a ku ji hin serkêş û rewakarên milîseyên ku bi xwe wan zordariyan li Efrînê pêk tînin ve hatiye avakirin, ji Rojnama "Inêb Beledî" re hebûna xwe diyar dîke û dibêje: Wê hejmarek malmewal li xwediyên wan ên bîngêhîn vegerandine, hin biryar bo qedexekirina ferzkirina vêrgî û baceyan li sar darên biber û werzên teneyan derxistine, û komîtak taybet ji bo parastina jîngehê, qedexekirina qutkirina daran, êzingirin û çêrandina bêwijdan, avakiriye; Lê, wê pirs nekir çima ew bînpêkirin pêk hatin? Bi xwe ya rast ew e ku, biryarên wê li ba milîseyên nandoz (ên ku, hemî rengên tewanan ji xwe re kirine kar, û herweha gefan bi sezakirinên hişk didin xelkê ger giliyan pêşkêşî komîtê bikin), weke avenûsa li ser kaxezê ye .

Li jêr emê ronahiyê bidin ser hin bînpêkirin û rewşa fewdalîzim û seberdayetiya ku li Efrînê serwerkirî:

= Gundê "Basûtê" û Pakrewanbûna du hemwelatiyan:

Gundê Basûtê navdar e, xwezaya wî xweşik e, û ciyê geştiyariyê û seyanan û gerê bû. Lê, mixabin ji Avdara 2018an ve, jerkî ji aliyê Artêşa Tirkîyê û nandozên wê ve hatiye dagîrkirin, ew xemgîn e û heyamên nevehesî û tewanbûnê li ser kon vedaye, û Milîseyên "Firqit Elhemzat" destlat dike, biryargeh û hepsên taybet û diziyane di "Xwaringeha Elehla, avahiya şaredariyê, Vêla Arêf Mihemed Betal û avahiya navenda telefônê" de çêkirine, ew biryargeh û hepsên ku ji girtin û revandina bi sedan hemwelatiyên xelkê gund û yên din re bûne bîner, yên ku tûşî cûrbecûr îşkencekirin û danûstandinên hişk û ferzkirina vêrgiyên diravî bûne. Tevahiya wan kiryanan jî di bin serpereştiya Istîxbaratên Tirkîyê de, pêk hatine û hîn jî berdewam in.

Di dema êrişkeriyê de gund û riyên sereke bi dehan avêjtekên hatin armanckirin, di encamê de malek bipiçekî hate wêrankirin û hin hemwelatî - di nav de jî zarok û jin - şehîd û birîndar bûn.

Di talana gund de, milîseyan kelûpelên hundir piraniya malan ji raxistok, alav, şênberên xwarinê, amûrên ênerciya elektrîka roniyê, firaxên baqirî, derî û penceriyên hin malan, tiştên dîkanan, û bi dehan alav û matorên duloqî û giropên avkêşa avê ji bîran, dizîn, û dest danîn ser stasyona sûtemeniyê ya hemwelatî "Silêman Îbo", Xwaringeha "Kaniyê" ya malbata keyayê gund (ya ku niha tenê ji bo dewatan tê bikaranîn), û bi dehezaran darên meywe û henaran ên hemwelatiyên bi zorê hatine koçberkirin, dora /30/ dîkanên li ser kolana serekî û dora /200/malên ku dora /300/malbatên anîndeyan tê de nişteci kirine, û tu rêdan ji kesî re nepejrandin. Herweha jî, keblên toreya telefona zemînî û stûnên wê û amûrên navendê hatin dizîn. Ji nişteciyên gund yên resen tenê dora /600/malbat maye.

Û tewana dawiyê li Siba 23.2.2021an bû, di wê sibehê de mala dilovanber "Şerîf Qasê" li Gundê "Basûtê" rastî du teqînên li dû hev bi bombeyên teqîner hat. Teqandina diwem a ku bi şewakî sistemkirî hatiye wênekirin ku çawa tekbîrên jêrazîbûn û serkeftinê yên ku çekdarên Islamî berî rûdana teqandinê bi çend kêlikan hildidin, di perçevîdiyoyekê de hate belavkirin; Û di encamê de hin beşên malê hatin roxandin û keça bi navê "Hêva Şerîf Qasê /21/sal" û merivê wê "Newzet Ekrem Tobal /45/sal" şehîd bûn, û ta niha destlatên dagîrker termên herdu pakrewanan li ba xwe hîştine û radest xwediyan nakin, herweha dora /75/ kes ji xismên herdu şehîdan û xelkê gund - di nav de jî dora /10/jinan - girtine, û hin ji wan girtiyan ev in (Diya "Hêva" û xwişka wê, hevîna "Newzet" û birayê wî "Omîd", Ednan Îbo, sê lawên Misto Hisên, Hec Xelîl Osman Henîf /70/sal û kurê wî, sê xwişk keçên Ehmed Xidir, Doran Emberoş - ê hatiye berdand). Di dermafê girtiyan de îşkencekirin û zext tê kirin, da ku gund bêşînin û xelkê wê tewanbar bikin. Û piştî ku "Basûtê" û herdu gundên cîran "Birc Ebdalo û Xezîwê" ji aliyê Istîxbaratên Tirkîyê û Asayîşa Leşkerî û "Firqit Elhemzat" ve û bi beşdariya serkêşên wê "Sêf Ebo Bekir" û "Ebdela Helawê" (yê ku berpirsiyarê nivîsgeha ewlehiyê li gund ji berpirsiyariya wî efû kiriye) hatine dorpêçkirin, tirsê kon vedaye. Û tevahiya wan biryanan jî ji bo tewanê bincil bikin û li ser tewankerên rasteqîn veşêrin. Tiştê ku çîroka wan ya ku dibêje (qurbanî ji aliyê Hêzên Sûriya yên Demokrat ve hatibûn karmendkirin û bombe di mal de hebûn) li erdê dixê û derewîn derdixê, ew e ku tu têkeliyên wan qurbanîyan bi Rêvebiriya Xweser a berê re û bi Partiya Yekîtiya Demokrat re tune bûn, û hîn berevajî wê têkeliya "Newzet" a bazirganiyê bi hin endamên "Elhemzat" re hebû.

= Fewdalîzim û serberdayetî:

-Li Êvara 21.2.2021an, hemwelatî "Mihemed Mihemed kurê Mihemed Soran" ji xelkê Bajaroka "Meydan Ekbezê", ji dîkana xwe ya bihevxiştina setelaytan a li Bajarê Efrînê, ji aliyê Milîseyên "Ehrrar Elşerqiyê û Elsultan Mûrad" ve, hate revandin, û li 26.2.2021an jî hate berdand.

-Li sibeha 24.2.2021an, li kolaneke şaxeyî li nêzîkî Gergeha "Newroz" li Bajarê Efrînê makînak "Van" hate teqandin, û di encamê de sê endamên Milîseyên "Ehrrar Elşerqiyê" bi kûranî birîndar bûn.

-Li 26.2.2021an, Milîseyên "Elsultan Mûrad, Elsultan Silêman Şah, Elhemzat" ên herî girêdayî bi Tirkîyê ve û bi hevrêzî bi "Asayîş Leşkerî" re (ya ku Tirkîyê li Herêmen ku bi "Mertala Feratê" têne navdan û Efrînê damezrandiye), kampanyek şopandin û êrişiyê di bin navê " jinavbirina revankariya li ser sînorê Tirkîyê" dest pê kir; Lê, Milîseyên "Elcebhe Elşamiyê" ew armanckirin ji xwe re dît, hêzên xwe kirin amedebaşiyê, û rêbendên xwe li derbasgehên Efrîn û Ezazê pir kirin, da ku nehêlibe tu hêz çekdar têkevin herêmen di bin serdestiya wê de (piştî nakokiya wan li ser çarçewa herêmen bandorbûnê û destdanîna ser jêderên wergirtina diravan), li rex wê jî ji bo çandina tirsê di nav xelkê de. Û ew tev jî di bin çavên Istîxbaratên Tirkîyê de (yên ku baş zanin bilîzin û fîtnê di nav hemî aliyên Sûrî de gur bikin) tê kirin.

=Gundin bûne wek avagehên Leşkerî:

-Nişteciyên gundên (Anqelê û Senarê - Cindirês) û yên din ku di bin serdestiya Milîseyên "Lîwa'i Elweqas" de wekî ku di cîgehên leşkerî de bin dijîn, bê rêdanên fermî (rojane yan heftane yan mehane) û (sê heyvane) ji alavan re û ji nivîsgeha ewlehiya wê de morkirî, çênabe ji gund derkevin û têkevin, bi behaneya parastina li ser jiyana sivîlan - li gor daxuyana berpirsiyarê nivîsgeha gundê Senarê yê bi "Îmad Bekûr" tê navkirin, û ya li vê dawiyê bi riya perçevîdiyoyekê re hatiye belavkirin.

Û li şeva 25.2.2021an, sê avêjtek li Bajarê Efrînê, li nêzîkî Nexweşxana "Avrîn" a berê û Gergeha "Maratê" û nêzîkî Dibistana "Feysel Qedûr" a berê (ya ku ji Artêşa Tirkîyê re bûye navend) ketin, û xuya dibe ku biryargehên ewlehiyê û leşkeriyê hatine armanckirin.

Ji sê salan ve heyîn û bûyerên li dû hev, gotina "Herêma Aram" a ku "Hikometa Eledalê we Eltenmiyê û serokê wê Erdoxan" digotin ê li Efrînê damezrînin, li erdê dixînin, herweha yên ku silogana "Şoreş û cîhadê" belav dikin, dicersînin, û weha jî ji dûr û nêzîk re tekez dikin ku Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ya girêdayî "Kiwalisyona Sûrî" - Ixwanî, nandoz û diz in û bê piroseyeke niştîmanî yan mirovahî ye.

28.02.2021an

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn

Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Wêne:

- Gundê "Basûtê" berî dagîrkeriyê.
- Kêlîdema teqandina mala Dilovanber "Şerîf Qasem."
- Herdu şehîd "Newzet Tobal û Hêva Qasem."
- Teqandina makînak"Van" li nêzîkî Gergeha "Newroz" - Bajarê Efrînê.
- Rêbendeke çekdar e Milîseyên " Elcebhe Elşamiyê" li Çateriya "Kefircenê" - Efrîn.
- Rêbendeke çekdar e Milîseyên "Lîwa'i Elweqas" li Gundê "Senarê" - Cindirês.